TAMÎRAT

Kirêdar: Mafên Xwe Bizanin!

Xwediyê xaniyê we nikare we ji xanî derxe ji ber ku we daxwaza tamîratê kiriye HETA KU:

Hûn an mêvanên we bi tevgerên ne maqûl nebûbin sedema pirsgirêka ku divê were tamîrkirin	We kirêya xwe dereng nexist	Çareserkirina pirsgirêkê ne hewceyî tamîrateke mezin be ku hûn neçar biminin ku ji xanî derkevin

Ger xwediyê xaniyê we hewl bide ku we ji xanî derxe, telefonî Parêzerê Mafê Tehliyeyê bikin.

Xwediyê xaniyê we berpirsiyar e ku...

- Xanî di rewşeke baş û jiyanbar de bigire.
- Deverên ku her kes bi kar tîne paqij û ewle bigire.
- Tamîratên daxwazkirî di nav maweyeke maqûl de pêk bîne wekî ku di peymana kirêyê de hatiye behskirin.

Ger di peymana kirêya we de wisa hatibe gotin, dibe ku hûn bi xwe hin tamîran bikin.

Ez çawa dikarim daxwaza tamîrkirinê bikim?

Divê hûn her gav bi nivîskî daxwaza tamîrkirinê bikin. Ji xwediyê xanî re nameyekê, e-maîlekê an peyamekê bişînin ku bila tê de **dîroka** ku hûn daxwazê dikin û **pirsgirêka** ku hûn dixwazin were tamîrkirin hebin. Ji bo ku bibe delîlek ku we daxwaz kiriye, **kopiyeke wê bigirin** û hilînin.

Ger xwediyê xaniyê we di nav demeke maqûl de tamîrê neke, dibe ku hûn karibin peymana kirêya xwe zûtir bi dawî bikin û ji xanî derkevin. Ji bo şêwirdariyê pêşî telefonî Parêzerê Mafê Tehliyeyê bikin.

Heke ew rewşeke lezgîn be?

Ger tiştekî giring xera bibe mîna **ronî, germkirin, gaz, av, kanalîzasyon an tesîsata avê** û xwediyê xaniyê we piştî daxwazakirina we ya nivîskî tavilê wê tamîr neke, li gorî qanûnê **maf û vebijarkên we yên taybet** hene. Dibe ku parêzerek di van babetan de ji we re bibe alîkar:

- **Qismekî ji diravê kirêya we bi kar bînin** da ku tiştan tamîr bikin.
- **Dozê li xwediyê xaniyê xwe vekin.**
- Dema ku hûn li benda tamîrkirinê bimînin, **pereyê kirêya xwe ji bo cihekî din ê mayînê bi kar bînin.**

Ji ber ku xwediyê xaniyê we tamîrat nekiriye, dev ji kirêdayînê bernedin.

Nedana kirêyê bi gelemperî kontrata kirêya we xera dike. Ger wisa bibe, **xwediyê xaniyê we dikare we ji xanî derxe.** Heke hûn neçar bin ku **diravê xwe xerc bikin** ji bo tamîrkirina tiştekî ku pêwîst e xwediyê xaniyê we tamîr bike, **dadger dikare wî diravî li we vegerîne. Meqbûzên xwe biparêzin** da ku hûn bikarin nîşan bidin ka we çiqas xerc kiriye.

Ger mala we ji ber pirsgirêkên mîna **kablokirina xerab, tesîsata avê an ahşabên riziyayî ne ewle** be, hûn dikarin bi riya (615) 862-6590 telefonî Metro Codes Administration bikin. Ger ew ji ber pirsgirêkên mîna **zibil, kêzik an mişkan ne tendurist** be, hûn dikarin bi riya (615) 340-5616 telefonî Wezareta Tenduristiyê ya Metroyê bikin.

LEGAL AID SOCIETY (833) 837-HOME

NHBA KURDISH KURMANJI - Repairs (615) 701-7957

AMAC American Muslim Advisory Council (615) 988-6460

NASHVILLE CONFLICT RESOLUTION CENTER

ROOFTOP NASHVILLE

Ev agahdarî tenê ji bo Davidson County ye. Agahiyên li vir hatî dayîn armanc nake ku pêşniyaza qanûnî pêk bîne. Heke pirsgirêkeke we ya hiqûqî hebe, ji kerema xwe telefonî parêzgerekî taybet bikin an telefonî Komeleya Alîkariya Hiqûqî ya Middle Tennessee ya herêmî bikin an jî bi riya hejmara 1-800-238-1443 telefonî ofîsa Cumberlandsê bikin an jî bi riya hejmara 1-615-701-7957 telefonî Yekitiya Baroyan a Nashville Hispanîkê bikin. Di 5/24an de hat revizekirin.